hejmar 59 - Payîz 2016

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî

> Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
> Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan
>
> Ehmedê Xanî
> (Sedsala XVII)

Civîna Stockholmê

Civîna Kurmancî ya 59an rojên di navbera 10 – 17.12.2016an de li Kitêbxaneya Kurdî li bajarê Stockholmê hat li dar xistin.

Di vê civînê de li ser van babetan hat kar kirin: Ji ferhengoka Memdûh Birîfkanî ya dawîya dîwana wî, Peyvên ji Berrîya Mêrdînê, Hin peyvên hêla başûrê Wanê, Tesîra zimanê asûrî/ siryanî li ser kurmancî, Şetrenc, Peyvên ji ferhengoka Jaba ya rewendan, Hin peyv ji ”Nameyek Şernexê” û Hin peyvên kêmnas/ nenas.

Ev hevalên han beşdarî civînê bûn: Rênas Awdal (Zaxo), Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Rojen Barnas (Diyarbekir), Michael Chayet (Waşington), Elîşêr (Wan), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Selam Nûman (Qamişlo), Zinar Soran (Dêrik), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

Berhemên ji xebata vê civînê li vê jêrê têne pêşkêş kirin.

Divekim û Vedikim:

Bandora zimanê sûryanî/aramî li ser kurmancî

Bi xameya : Michael L. CHYET

Di vê lêkolînê da, behsa taybetmendîyên devokên du deverên Kurdistanê tê kirin – Behdînan tevî Şîrnex û Hekkarîyan ji alîyekî, û Tûr ‘Abdîn ya Mêrdînê ji alîyekî din – ku têda akincî yan rûniştvan yan binecîyên mesîḧîyên sûryanî-axêv bi sedan salan li teniştа kurmancan jiyane. Texmîna min wisa ye, ku sûryanî-axêv li pêvajoya sedsalên borî hînî kurmancî bûne, û ku wan -- çend alîyên rêzimana kurmancî bi şaşî fêm kiribûn, û ku ew şaşîyên wan bûne norma kurmancî ya wan deveran.

I. Lêkerên hevedudanî. **Ve-di-kim** ***yan*** **di-vekim** Pêşpirtikên ku yan berî yan paş nîşana dema niho *di-* tên ev in: *ber-, çê-, da-, der-, hil-, ra, rû-, ve, wer-*.
Di pirranîya devokên kurmancî da û bi giştî di soranîyê da, nîşana dema niho *di-* (*[d]e-* bi soranî) dikeve di navbera van pêşpirtîkan û reh (yan koka) dema niho ya lêkeran; lêbelê li deverên behskirî (Behdînan tevî Şîrnex û Hekkarîyan ji alîyekî, û Tûr ‘Abdîn ya Mêrdînê), nîşana dema niho *di-* tê pêş van pêşpirtikan. Herwisa, nîşana neyînî *na-* jî. Mînak:

Kurmancî	*Behdînî û Torî*	*Soranî*
(Ez) hil-**di**-gr-im	**di**-hil-gr-im	heł-**de**-gr-im
(Ez) rû-**di**-n-im	**di**-rû-n-im	da-**de**-nîş-im

Neyînî:

Kurmancî	*Behdînî û Torî*	*Soranî*
(Ez) hil-**na**-gr-im	**na**-hil-gr-im	heł-**na**-gr-im
(Ez) rû-**na**-n-im	**na**-rû-n-im	da-**na**-nîş-im

Em binêrine şikla fermanî (împeratîf) ya van lêkerên hevedudanî:

hil-**di**-gr-im	*fermanî*:	hil-gr-e
rû-**di**-n-im	*fermanî*:	rû-n-e

Texmîna min wisa ye: ji bona yên ku hînî kurmancî dibin, xuya ye ku şikla fermanî ya lêkerên wek *rûne!* Yan *veke!* reha dema niho ya van lêkeran e, û li gorî wê mentiqê, dema niho bi xwe dibe *di-rûn-im* û *di-vek-im* li şûna *rû-di-n-im* û *ve-di-k-im*.Bi giştî xwendekarên zimanên biyanî bi vî awayî rêbaz û qanûnên rêzimanî sade dikin (simplification).

Ev rewşa hanê di farsîyê da jî tê xuya kirin: Li şûna ***di-*** ya kurmancî ***mī-*** heye, ku bi tacikî û darîya Efxanistanê wek ***mē-*** tê xwendin. Di farsîya Îranê da, ***mī-*** dikeve navbera pêşpirtikê û reha dema niho ya lêkerê, lêbelê di devokên tacikî û darî da, ***mē-*** li pêş e, wek mînak: Farsî ***ber-mī-ā-yem*** = ‘Ez derdikevim’ beramberê tacikî û darî ***mē-ber-ā-yem***; Farsî ***der-mī-āver-em*** = ‘dertînim’ beramberê tacikî û darî ***mē-der-ār-em***.Li Efxanistanê, axêverên zimanên puştûyî û ûzbekî wek zimanê duwem hînî farsî dibin, û her wisa li Tacîkistanê û li Ûzbekistanê tacikî-axêv û ûzbekî-axêv bi sedan salan li teniştа hev jiyane. Vêca rewşa sosyolîngvîstîk ya van zimanan dişibihe rewşa kurmancî û sûryanî.

II. Dema paşerojê ya lêkeran. Hem bi kurmancî û hem jî bi aramîya nûjen (sûryanîya nûjen), dema paşerojê ji nîşana paşerojê (ê/dê/wê bi kurmancî û bit- bi aramîya nûjen) tevî geranî (yan subjunktîf)a dema niho pêktê: mînak: ***Ew ê bi-pirs-e*** û ***Ez ê bi-pirs-im***; **bit-*mbaqir*** û **bit-*mbaqr-in*** bi aramîya Nûjen (***mbaqir*** = ***bi-pirse***). Li Behdînan û her wisa li Tûr ‘Abdîn jî, pêşpirtika ***bi-*** ya geranî/subjunktîfê kêm e: mînak, dibêjin ***dê pirs-ît*** û ***dê pirs-im*** li şûna***Ew ê bi-pirs-e*** û ***Ez ê bi-pirs-im***.Di van devokan da, reha tazî ya dema niho (***pirs-***) dişibihe şikla geranî/subjunktîfê ya aramîya nûjen (ango ***pirsît*** dişibihe subjunktîfa tazî ya aramî ***mbaqir***). Ji ber ku ev diyardeya hanê bi tenê xuya ye di devokên kurmancî da yên ku li teniştа mesîḧîyên aramî-axêv hene, em dikarin wê yekê wek bandora zimanê aramî li ser kurmancî bibînin.

III. Nîşankirina zayenda rengdêran û partîsîpên dema borî. Di devokên behdînî da, zayenda rengdêran tê diyar kirin: wek mînak: **yê** baş – nêr e; **ya** baş – mê ye; **[yê]t** baş – pirhejmar e. Ji ber ku di zimanên samî da (ango ‘erebî, aramî/sûryanî û ‘ibrî), zayenda rengdêran her gav bi qertafekê tê nîşandan (mînak: ṭayyib = yê baş [nêr]; ṭayyiba = ya baş [mê]; ṭayyibīn = yêt baş [pirhejmar]). Li Tûr ‘Abdîn jî, ev diyarde jî heye, herçende ku bikaranîna wê kêmtir xuya ye.

nêr:	***wê***	yan	***î***	= yê bi behdînî
mê:	***wa***	yan	***a***	= ya bi behdînî
pirhejmar:	***wê***	yan	***[y]a***	= yêt bi behdînî

Mînak: Paîza, tirh û şebeş û petîx jî, ***a*** zeḧf in.; Ew Ḧeywanat Ḧemû jî ***a*** sêhrkirî ne
Destnîşankirina pirhejmar wek ‘a’ li şûna ‘ên/êt’ – şaşîyên xwendekaran tîne bîra mirovî, yên ku ‘*dest***an*** min’ li şûna ‘dest***ên*** min’ dibêjin.
Vêca, ev yek -- nîşaneke din ya şaşîyên bîyanîyan e, yên ku hînî kurmancî bûn.

IV Li Behdînan, li şûna ***hiştin/hîştin*** şikla ***hêlan*** heye. Reha dema niho jî: ‘***di-hêl-im***’. Bi soranî jî dibêjin ***hêştin (***dema niho: ***de-hêł-im),*** û her wisa bi farsî jî lêkera ***haštan*** jî heye (dema niho: ***mī-hal-am***), ku îro kêm bi kar tê. Ji ber ku ***hêlan*** bi tenê li Behdînan (û li Qerejdaxê jî, li gorî Mehmûd Lewendî) diyar e, ez wisa texmîn dikim ku ev yek jî mînakeke din ya şaşîyên bîyanîyan e, yên ku hînî kurmancî bûn.

Hin peyvên kêmnas – nenas

- VI -

Amadekar: Reşo ZÎLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
şîl kirin; tûjî kirin, zûl kirin	dilimlemek	couper en tranches	to slice
şîl; tûjî, tîşk, kûzî, zûl, tîfş	dilim	tranche	a slice (for fruite)
şîlaq; şilmaq, zîrçoq	çapak	chassie	eye gunk
şopik	merdane	rouleau	rolling-pin
şurt; qarûş	sokak süpürgesi	grand balai	big broom
şût; şematokî, hulî	kaygan	glissant	slippery
şûtikîn	kaymak	glisser	to slip
tefeş; rû, çehre	çehre, yüz, surat	face, visage	face
tefeşpan; rûpan	geniş çehreli	visage plat et large	flat face
telb	kurum	suie	soot
terş; pez	küçük baş hayvanlar	ovin	sheep and goats
terşvan	küçük baş hayvanlar çobanı	berger d'ovins	sheepkeeper
berdestik	mutfak eldiveni	gant de cuisine	glove shaped pot holder
tileylan (cizîrî)	palyaço	clown	clown
til kirin (qoçgirî); avêtin, çekirin	atmak	jeter, lancer	to throw
tilmiz; tilik	şıngıl, çitmik	grapillon	a piece of bunch
tînalk; dirrî, dirrik, strî, kelem, qelem	diken	épine	thurn
ting (t'ing); sergo, basme	gübrelik	fumier	dunghill
sergo; poxang, gûfank, sergîfk	mezbele, çöplük	décharge publique	tip, dump
tirak; tirag	sandalet	sandalette	sandal
tîrava; wexta 'esrê ye, 'esir	ikindi	milieu de l'après-midi	midafternoon
tirmêt; tirbît, hevalên jidil û samîmî, <filankes û filankes tirmêtên hev in>	tanış, tanıdık, samimi arkadaş	ami sincère, ami dévoué	close friend
ûd; minet	minnet	obligation, dette de reconnaissance	gratefulness, obligation

Ji ferhengoka Memdûh Birîfkanî

ya dawîya dîwana wî

- III -

Amadekar: E. NAROZÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
pelixîn	ezilmek, darbeyle ezilmek	être écrasé	to be crushed
pelîşqe; kevn û kot	külüstür, eski püskü, pejmürde	vieillerie, usé, élimé	worn out
peqîşk; batifk, belqok, peqik, peqpeqik	kabarcık	ampoule, cloque	blow, blister
perîşk; pirmîçk, kuliyên berfê	kar tanesi	flocon de neige	snowflake
perozînk	karmaşa, kargaşa, bela	trouble	trouble
peyak; kesê ku ji axa xwe dûr dikeve, barkirî, koçkirî	gurbetçi, göçmen	émigré	immigrant, migrant
pêrar	bir önceki yıl	il y a deux ans	two years ago
pêrpîne	semiz otu	pourpier	purslane (*portulaca oleracea*)
pêşkêş; diyarî <ev pêşkêşa min e>	hediye	présent, cadeau	gift
pifdank; zeqzeqe	balon	ballon	balloon
pirêmiz; prîmûs, pirmûs	purmuz	réchaud de camping	primus
pişî/pîşî/piş; kêxmîte, kimxîte	un tozu	poussière de farine	milldust
pitpit; pitepit	dırdır	grommellement, murmure	grumble, murmur
pût	cılız, güçsüz	chétif, maigrichon	puny
pîremêr; kalemêr	yaşlı erkek	vieillard	old man
pilox; pûx	tam olgunlaşmış	bien mûr	overripe
porpor; lomekirin, pûkepûk, pitepit	dırdır	grommellement, murmure	grumble, mumble
ripin; repin	bitki kökü	racine	plant root
taf, afet	bela, afet	calamité, désastre	disaster
tamar/temar; tamara xewê, morîka xewê	derin uyku	sommeil profond	deep-sleep
tamîzk; şevtirsk, hilbûn/hildan	uçuk	bouton de fièvre, herpès	cold sore
tebayî; tevahî	birlik, birliktelik	ensemble, totalité	togetherness, together
tilîz/telîz bûn; (terr û telîz bû) <kabarcık su topladı>	su toplamak (sivilce için)	s'infecter, devenir purulent	inflamed (blister)

Ferhengoka kurdî ya A. Jaba 1858

devoka Hekarî û revendên li derdora Mûş û Bazîdê - III -

Amadekar: ELÎŞÊR

	kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
cirnix	şemate, hêwirze	şamata, hengame	tumulte, vacarme	tumult
cûn	cûm	bir çiğnemelik	chique, quantité à mâcher en une seule fois	a mouthful of chewing gum
cihal	çewal	çuval	gros sac	sack
çespan	çapik	çevik	agile	agile
çekme	cizme	çizme	botte	boot
çuneyî	tuneyî	yokluk; fakirlik	indigence, pauvreté	nothingness; poverty
çûyîn	çûn	gitmek	aller	to go
çûye şû	çûye mêr	evlenmiş kadın	mariée	married women
çêr	xeber	küfür	juron, invective	swear
dadfiryad	hewarûgazî	feryat ve yardım	appel au secours	sos
debîr	katib	sekreter	secrétaire	secretary
dik	sekû	seki	banc en terre battue	a platform or earth bank
di gel yekûdû	bi hev re	birlikte, beraber	ensemble	together, togetherness
demîn	xûy	huy, alışkanlık	caractère, nature	habit, temper
dewar	hesp	at	cheval	horse

Hin peyvên hêla Başûrê Wanê

Amadekar: Mele ŞEBAN TURGUT û ELÎŞÊR

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
axur; rêya paxêlan	yük kızağı yolu ve izi	piste de traîneau	sled path and track
baskê hiryê; hirya şehkirî ya ji bo ristinê li mil hatî alandin	eğirmek üzere kola sarılan yün miktarı	quantité de laine peignée enroulée autour du bras pour être filée	in spinning yarn, yarn wrapped around arm
berçik; ciyê qûtreşandina teyran	kuş yeminin serpildiği yer	endroit où on jette des grains pour les oiseaux	place where birdseed is strewn
berkur; çermê xebxebê	boynun altındaki sarkık deri	fanon	dewlap
berqendik: benê li ber kofîyê tê girêdan	hotozun etrafına bağlanan kaytan	cordelettes de la haute coiffure traditionnelle kurde	ornate cord for women's headdress
bêçî; sexel; navê karik û berxan a bi giştî	oğlak ve kuzu sürüsü	troupeaux d'agneaux et de cabris	herd of kids and lambs
biçirk; kada bê mirtoxe, bê kakil	yağlı sade çörek	petit pain au beurre	unsweetened plain pastry
bilulik; lûleya ji darê çêbûyî ya bi heyayê zarokê kur ve dihat girêdan ku cihê xwe şil neke	küçük çocuklarda sidik akıtma kavalı	tube en bois fixé au pénis de petits garçons pour les empêcher de souiller leur lit	in baby boys wooden tube for preventing bedwetting
biluvan: perdeya li ser berxika nû hatîye dinê	yeni doğmuş oğlak veya kuzuyu çevreleyen zar	membrane entourant un agneau nouveau né	membrain around newborn lamb
bindanik; nanê ji arvanê ber destarê	eldeğirmeni unundan yapılmış ekmek	pain fait avec de la farine du blé moulu avec un moulin à main	bread made from flower ground in a handmeal
birnut; birnotî	enfiye	tabac à priser	snuff
bizmîrik; bizmik	burunluk	muselière	muzzle
bor; darê ku livayê lê dipêçin	keçe dürüm sırığı	bâton autour duquel on enroule la laine cardée	stick for cardıng felt into batt
cawiya gûnîyê; benîştê gûnîyê	geven sakızı	gomme d'astragale	a type of astragalus gum
cehcur; erdê hatî kutan, hatî qahîmkirin	basılarak sıkıştırılmış toprak	terre compressée	compressed soil
celeb; koma masîyên ku payîzan koç dikin	güzün göçen balık sürüsü	banc de poissons migrant en automne	fish flock which migrate during the autumn
çarberî; tifka aşvanî, cihê agirê aşvan	değirmenci ocağı	âtre du meunier	fireplace of a miller
çemberak; şîşa yan hesina devê tirpanê bi destîyê ve girê dide	pırazvana	partie aigue du râteau qui s'encastre dans le manche	tang
çilak; singa bi arîkan ve tê aliqandin	çengel (ağaçtan)	crochet en bois	wooden hook
çilaq; sîle, zileh, şemaq, şimaq, şîmaq, şîrmaq, şeqam, şilaq	tokat	gifle	slap
çingiz; mirovê kurt û lawaz	kısa ve sıska	de taille courte et malingre	short and skinny
destbilunik; destbênk, destbilînk; benê zarok di landikê de pê tê girêdan	bağırdak	bandelette ou cordon entourant le berceau pour empêcher le bébé de tomber	the strap with which a baby is kept in its cradle
deveker; qismê ji zevîyê yê nehatibe dûritin li ser pêyan maye	tarlanın biçilememiş bölümü	partie non labourée d'un champ	part of field which has not been harvested
dexş; dehf, dehfdan	iteleme	poussée, bousculade	push
dewilte; dewij, dewijn, tiflê li ser nivişkê qijilandî dikeve	eritilmiş yağın üste çıkan tortusu	écume se formant à la surface du beurre fondu	froth that forms on the surface of melted butter
dunhe; dange, cihê alifê pez a li ser berfê	kar üstünde küçük başhayvanlara yem verildiği yer	emplacement sur la neige pour le fourrage des ovins	sheep forage place on snow
êsîle; goşe, qurnet (ji bo keleh û xanîyan… birîna penîrê wekî çarêsîle/çargoşe; penîrê çarêsîle)	köşe	coin	corner
fisose; cûreke kûjeyan a bêhn jê tê	kokarca	putois	skunk
gerdîle; toterik, tayîre, çerx, teker	tekerlek, teker	roue	wheel
gindir; gundor, bejna insanê kurt û tijî	kısa ve tıknaz	courtaud	short and fat
gizim (kirin); xwe jê re hişk kirin	horozlanmak	se pavaner, faire le bravache	to swagger
gizîre; gizre, xang	yemlik olarak kaldırılan meşe yaprakları yığını	amas de feuilles de chêne stockées comme fourrage	oak leaves organized as a stack
gîrnijîn; bişirîn	gülümsemek	sourire	to smile
gîsî; cihê birînê	yara izi	cicatrice	scare
gocar; koçak, palê herî dawîyê	artçı ırgat	le dernier moissonneur d'un rang	the last reaper in the row
gulte; balgeya stûnê, serstûn	sütun başlığı	chapiteau	column head
gurgemêş; har, hirçê gurgemêş; hirçê har	azgın ayı, kuduruk ayı	ours en furie	furious bear

Devokê Berriya Mêrdînê

- X -

Amadekar: Hemîd KILIÇASLAN


kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
kozîya agir; kêle	ateş yakmak için yapılan odun/ tezek veya çırpı çatısı	disposition conique de bûches ou de brindilles pour faire le feu	pyramid fire
kulbuşî; kurî, kulbî <ji kulbuşî xwarin>	açgözlülük, açgözlülükten yemek	avidité, <manger par avidité>	greed, rapaciousness
şegreşîwan	ağıtçı kadın	pleureuse, vocératrice	female professional mourner
hitil-mitil	illahî	quoi qu'il arrive	or else
kurreder; qurreder	elin körü, zehir zıkkım	ferme la !, ta gueule !	general curse word, shut up !
kurrûze	paket, kutu, karton	paquet, boîte	pack, box
kurtêlxur	otlakçı, başkasının sırtından geçinen	parasite, pique-assiette	freeloader, sponger
kutayî, raçandina baş	iyi dokunmuş	bien tissé	well woven
latan	deve bacağı	patte du chameau	camel leg
lûl	gezinme, dolanma	promenade, flânerie	wander around
lûl bûn	gezinmek, dolanmak	flâner, se promener	to wander around
malanî; malane	eve yaraşır ev hanımı	maîtresse de maison	housewife
maltin; maliştin	süpürmek, silmek	balayer, essuyer	to sweep, erase
mazmaze	kart koç, yaşlı koç	vieux bouc	old ram
mejîleqandin	1. beyin sarsıntısı, 2. sapıtma	1. choc cerébral, 2. déraillement, dérangement	1. brain concussion, 2. go haywire
melkezêt, merkezêt	ince ve şefaf bir tür kumaş	variété de tissu mince et transparent	a type of tiny and transparent fabric
merkeb; seleşîr, seleşîr, çapîk	altına yemek konulan büyükçe sepet	grand panier en forme de cloche sous lequel on met la nourriture à protéger des animaux	upside down basket for protecting food from insects and animals
mestere; nimûne	örnek, nümunelik	échantillon	sample
mewîjok; hêşînok; wek pizikan sor dibe, tayeke dezîyê rengîn tê hildikişînin	mavi irinli çiban	pustule à pus bleuâtre	a type of foot blow
miz, mize	mayhoş	acidulé	tart
mezeloq	yapışkan	collant, gluant	sticky
mîl	yara fitili	mèche médicale	wound wick
mirarokî; mirîmirî	ölgün	mourant	deathly looking
mirçînî	şaplatma	claquement	clapping
mixmixîn; ximximîn	patates, soğan, et vb.nin bütün halinde ocak veya tandırda ateş altında veya fırında kapalı bir kap içinde iyice pişmiş durumu	(légume) cuit braisé ou étuvé	to roast (onions, potatoes, etc.) thoroughly

Şetrenc

Amadekar: Selam NÛMAN

kurmancî	tirkî	fransizî	ingilîzî
şetrenc, setrenc, kişik	satranç	échecs	chess
texteyê şetrencê	satranç tahtası	échiquier	chessboard
malik	hane	case	square
malikên rengtarî	koyu haneler	cases noires	dark squares
malikên rengvekirî	açık haneler	cases blanches	light squares
berik, kevir	taş	pièce	piece
kevirên spî	beyaz taşlar	pièces noires	white pieces
kevirên reş	siyah taşlar	pièces blanches	black pieces
şah, melik	şah	roi	king
wezîr, ferezîn	vezir	reine	queen
keleh, rex	kale	tour	rook
hesp	at	cavalier	knight
fîl	fil	fou	bishoppion
peyak, peya, serbaz, cundî, beydeq	piyon	pion	pawn
şahmat, şaxmat	şah mat	échec et mat	checkmate
teslîm!	mat!	mat	resignation
pate, beraber, serbiser, dergûşî, dergûşkî	yenişememe, berabere kalma	match nul, pat	draw
vekirin	açılış	ouverture	opening
federasyona cîhanî ya şetrencê	dünya satranç federasyonu	fédération mondiale des échecs	world chess federation
rêbazên şetrencê	satranç kuralları	règles des échecs	rules of chess
rêz	yatay sıra	rang horizontal	rank
stûn	dikey sıra	rang vertical	file
kiş	şah	échec	check
pateya bêkiş	pat	impasse	stalemate
livên vekirinê	açılış hamleleri	mouvements d'ouverture	opening moves


rox	rok	roque	castling
di derbasbûnê de	geçerken almak	en passant	in passing
payedarkirin	piyon terfisi	promotion	promotion
xwarin	almak	prendre	to capture
liv	hamle	mouvement	move



Texteyê şetrencê



Kevirên şetrencê



Rêza kevirên şetrencê



Şah, melik



Wezîr, ferezîn



Fîl



Hesp



Keleh, rex



Peyak, peya, serbaz, cundî, beydeq



rêzkirina kevirên şetrencê

Hin peyv ji "Nameyek Şernexê"

ya pirtûka Evdirehman Gundikî

- I -

Amadekar: Mistefa AYDOGAN

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
aravî	açık mavi	bleu clair, bleu de lessive	light blue
avrijînek	suyun durmadığı eğimli arazi	pente raide ou l'eau coule sans cesse	sloping land where water constantly flows down
avxwerik	sel sularının arazide oluşturduğu oyluk	cavité creusée par des crues	shallow gully
bablesût	hortum	tourbillon	whirlwind
bakut	rüzgarla oluşan kar yığını	congère	snowdrift
balingî	yastık	oreiller	pillow
bapîçk, bapêçk	dürüm	rouleau	roll (of food)

bavdost	babanın arkadaşı, dostu	ami du père	father's friend
bavenî	rüzgar almayan yer	endroit à l'abri du vent	windless place
bebleşêr (bableşêr)	aslan yavrusu	lionceau	lion cub
belsîs	dik kulaklı beyaz tiftik keçisi	chèvre angora blanche aux oreilles droites	upright eared white Angora goat
berbin	dağ eteği düzlüğü	plateau de piedmont	mountain range
berdolik	küçük koyak	petit vallon	small cove
berreşe: xwehdana simbêlan	bıyığı terleme çağı	puberté (lit. âge de transpiration de la moustache)	puberty (lit. perspiration of the mustache)
berevez: berqefa	rüzgar ve yağmur almayan doğal korunak	abri naturel qui protège du vent et de la pluie	wind-safe and rainsafe natural shelter
bergelî	ana vadiye açılan dere yatakları	lits de ruisseaux aboutissant à la vallée principale	creek bed in the main valley opening
berhilûsok	kaygan taş	pierre glissante	slippery stone
berûk	saf tutmuş tarım işçilerinin işe koyulma vaziyeti	mise au travail d'ouvriers agricoles disposés en rang	line of farmers working in the field
beten	toprak örtülü eğimli dağ arazisi	terrain montagneux escarpé	sloping mountain land covered with soil
binas	suç, hata	faute	crime, fault, guilt
binaskar	suçlu, hatalı	coupable, fautif	guilty, criminal
bixurûk	çiçek tozu	pollen	pollen
bolik	genç kız ve delikanlıların karşılıklı atışmaları	chant lyrique interprété en alternance par des garçons et des filles	lyric sung in alternate repartee by a male and a female
bûklûk	tomurcuk	bourgeon	bud, rosebud
ciwanekeç	genç kız	jeune fille	young girl
coqî: birr	grup (insanlar için)	groupe (d'hommes)	group (of people)
çakemêr	yiğit	brave	brave
çakemêranî	yiğitlik	bravoure	bravery
çakemêrane	yiğitçe	bravement	bravely
çavşelipî	çekik gözlü	qui a des yeux bridés	slant-eyed, almond-eyed
çêrik: dûrikên dawetan, dîlok, dîlanok, stranên dawetan	halay türküleri	chanson de danse, air de danse	dance song
çim(ik)	koyun veya keçi tırnağı	sabot d'ovidés	sheep hoof
çîq(ik): çît	çit	claie	reed fance
çîx xwastin	meydan okumak	défier	to defy, challenge
darmêş	yaban arılarına kovan işlevi gören ağaç kovuğu	ruche d'abeilles sauvages dans un creux d'arbre	wild bees' trunk hallow hive
dêhleşêr: dêleşêr	dişi aslan	lionne	lioness
dêhl-: dêl-	köpek, kurt vb gibi hayvanlarda dişilik ön eki	femelles	prefix denoting a female animal
deqdan: distan,dûzdan, sêpik, dexdanik, xacirgan	sacayağı	trépied	trivet
derkon	çadır önü	pas de la porte de la tente	the area in front of the tent

Gulûgîyayên Kurdistanê

- II -

Amadekar: Ehmedê DIRIHÎ

Beşa *Kurdicum* û *Kurdica*


Latînî	Kurdî
Astracantha kurdica	Gunîya kurdî
Aubrieta parviflora var kurdica	Dîdaya kurdî
Centaurea kurdica	Çavbeloqa kurdî
Cephalanthera kurdica	Salepa kurdî
Colchicum kurdicum	Ciwanemerga kurdî
Corydalis rutifolia subsp kurdica	Şepirzeya kurdî
Cynara kurdica	Engînara kurdî
Daphne oleoides subsp kurdica	Defneya kurdî
Delphinium kurdicum	Delava kurdî
Draba bruniifolia subsp kurdica	Gulzerîna kurdî
Euphrasia kurdica	Devhirça kurdî
Hedysarum kurdicum	Guringeya (qoringe) kurdî
Iris reticulata kurdica	Newroza kurdî
Koeleria kurdica	Giyagewrika kurdî
Linaria kurdica	Belgîzera kurdî
Marrubium kurdicum	Pisila kurdî
Noanea kurdica	Sewinceya kurdî
Paronychia kurdica	Kepeka kurdî
Potentilla kurdica	Hêzgiyaya kurdica
Prangos kurdica	Heliza kurdî
Pterocephalus kurdicus	Sirgeya kurdî
Rhynchocorys kurdica	Nukloya kurdî
Scabiosa kurdica	Zîwana kurdî
Scorzonera kurdica	Zirgizêra kurdî
Scutellaria kurdica	Majarka kurdî
Sideritis libanotica subsp. kurdica	Çayçiyaya kurdî
Symphytum kurdicum	Mijmijoka kurdî
Taraxacum kurdicum	Giyakewa kurdî


Astracantha kurdica - Gunîya kurdî


Aubrieta parviflora var kurdica - Dîdaya kurdî


Centaurea kurdica - Çavbeloqa kurdî


Cephalanthera kurdica - Salepa kurdî


Colchicum kurdicum -
Ciwanemerga kurdî


Corydalis rutifolia subsp kurdica -
Şepirzeya kurdî


Cynara kurdica -
Engînara kurdî


Daphne oleoides subsp kurdica -
Defneya kurdî


Delphinium kurdicum -
Delava kurdî


Draba bruniifolia subsp kurdica -
Gulzerîna kurdî


Euphrasia kurdica -
Devhirça kurdî



Hedysarum kurdicum -
Guringeya (qoringe) kurdî


Iris reticulata kurdica -
Newroza kurdî


Koeleria kurdica -
Giyagewrika kurdî


Linaria kurdica -
Belgîzera kurdî


Marrubium kurdicum -
Pisila kurdî


Noanea kurdica -
Sewinceya kurdî


Paronychia kurdica -
Kepeka kurdî



Potentilla kurdica -
Hêzgiyaya kurdica


Prangos kurdica -
Heliza kurdî


Pterocephalus kurdicus -
Sirgeya kurdî


Rhynchocorys kurdica -
Nukloya kurdî


Scabiosa kurdica -
Zîwana kurdî


Scorzonera kurdica -
Zirgizêra kurdî


Scutellaria kurdica -
Majarka kurdî


Sideritis libanotica subsp. kurdica -
Çayçiyaya kurdî


Symphytum kurdicum -
Mijmijoka kurdî


Taraxacum kurdicum -
Giyakewa kurdî

Beşa *Kurdistanica*

Latînî	Kurdî
Aquilegia kurdistanica	Pêkotira kurdistanî
Bellevalia kurdistanica	Gêleqira kurdistanî
Crepis kurdistanica	Sîroka kurdistanî
Crucianella kurdistanica	Spîneşa kurdistanî
Paeonia kurdistanica	Gulhirça kurdistanî
Scilla kurdistanica	Gêlika kurdistanî



Aquilegia kurdistanica
Pêkotira kurdistanî



Bellevalia kurdistanica -
Gêleqira kurdistanî



Crepis kurdistanica -
Sîroka kurdistanî



Crucianella kurdistanica -
Spîneşa kurdistanî



Paeonia kurdistanica -
Gulhirça kurdistanî



Scilla kurdistanica -
Gêlika kurdistanî

Beşa *Carduchorum* - kardoxî

Latînî	Kurdî
Allium carduchorum	Sîrmoka (sîrim) kardoxî
Amygdalus carduchorum	Behîva kardoxî
Biarum carduchorum	Karîya kurdoxî
Convolvulus carduchorum	Lavlavka kardoxî
Delphinium carduchorum	Hêzerana kardoxî
Fritillaria carduchorum	Gulşilêra kardoxî
Onopordum carduchorum	Kerenga kardoxî
Thesium carduchorum	Giyastêrka kardoxî



Allium carduchorum -
Sîrmoka (sîrim) kardoxî



Amygdalus carduchorum -
Behîva kardoxî



Biarum carduchorum -
Karîya kurdoxî




Convolvulus carduchorum -
Lavlavka kardoxî



Delphinium carduchorum -
Hêzerana kardoxî



Fritillaria carduchorum -
Gulşilêra kardoxî



Onopordum carduchorum -
Kerenga kardoxî



Thesium carduchorum -
Giyastêrka kardoxî

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, *www.fikp.org*
Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN,** *Réalisation :* **M. HASSAN**